


YEKRÊZIYA KURDÎ
PÊWISTIYEKE
HEBÛNÎ YE



Tabloya Ekrem Bekir

PEYVA WELAT

Yekrêziya kurdî pêwistiyeke
hebûnî ye

Desteya sernivîs

Çi gel an giropeke mirovî, dema ku rastî gefekê tê ku ew gef hebûna wî dixê jêr metirsînê de, ew gel an ew girûp xwe li hev digire û li hemberî wê gefê dibe yek. Her kes dizane ku yekîti xurtbûn e, û bi yekîtiyê hêza gel zêde dibe û dihêle ku dijminê wî gelî bi çavê tirsê lê binere û hisaban jê bike.

Dijmin herdem hewil dide ku gelan parçe bike û nakokiyên di nav gelê bindest de biçîne û tevrake da ku bi hêsanî karibe serdestiya xwe li ser bimişîne û wî wekî kole û peyrewekî ji xwe re bihêle.

Li ser dirêjahiya dîroka gelê kurd, dagîrkerên Kurdistanê dikaribûn siyaseta parçekirinê li ser gelê kurd bimeşînin, û heya niha jî ew di vê siyaseta de biserketine. Çimkî sedema sereke a berdewameya bindestbûna kurdan û têkçûna wan parçebûn e. Di her qonaxê de dîrokî de ku tekoşîna gelê kurd tere derasbûye, bangewaziyên yekîtiyê û yekrêziyê ji hêla ronakbîr û rewşenbîrên kurd ve derdiketin û doza lihevkerî û yekîtiyê li serkêşên kurdan dikirin, lê mixaîn ew bangewazî bê bersiv diman û dihatin paşgukirin.

Ji qonaxa Ehmedê Xanî bigirin heya roja me ya îroj, bangewaziyên yekîtiyê lidar in, lê pîlanên dijminan wan bangewaziyên vala derdixînin.

Qonaxa ku em tere derbasdibin pir dişebe wan qonaxên ku tê de kurd nêzî azadî û serxwebûna xwe bûn, û nexweşiya parçebûnê û nakokiyên hîn ji nav kurdan ranebûye.

Îro roj kurd li hemberî pozberiyê pir mezin, pozberiya hebûn û nebûnê ye. derfeteke zêrîn di nav destên kurdan de heye ku karibin mafê xwe yê rewa bidest bixin û jiyanê azad û rûmetdar bijîn. Di heman demê de dijminên gelê kurd di nava tevgerê de ne û hemû hewldanên xwe dikin da ku vê derfetê ji destê kurdan derxînin û wan ji xwe re wekî kole û peye bihêlin, û da ku vê armanca xwe pêkbînin şerê qirkirinê li dijî gelê kurd dimeşînin, herî dawî jî êrîşa wan ya li Serêkaniyê û Girê Sipî, û berî wê li Efrînê. Dijminên gelê kurd li ser du astan şerê wî dikin, ji alîkî bi çekan êrîş dikin û kurdan dikujin û wan ji

Kovara WELAT
Çandî- Giştî- Mehane

Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Imran Yûsiv

Dizayner:
Hesen Berzencî



Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpîrê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

deverên wan derdixînin û dixwazin guhertina demografî li deverên kurdî pêbînin da ku ji binî de kurdan ji hole rakin, ji alîkî din ve nakokiyên di nav kurdan de diçînin û wan ji hev dûrdixînin da ku wan lawaz bikin û sûdê ji vê parçebûnê werbigirin û listokên xwe yê qirêj di rîya parçekirina kurdan re bimeşînin û bigihînin serî.

Îro roj tevgera siyasî ya kurdî li pêş berpirsyariyê dîrokî ye, an divê nakokiyên xwe û berjewendiyên xwe yê partîtî bidin hêlekê û li hemberî gefên dijminan bibin yekhelwest û di yek rêzê de rawestin, wê gavê dê bikaribin azadî û rizgariya gelê xwe misoger bikin, yan jî dê ev derfeta dîrokî ji dest wan biçe û dê qirkirin para gelê kurd be, wê gavê dê dîrok nîfretê li wan bîne.

Em jî dengê xwe tevî hemû dengên ku yekrêziya tevgera kurdî dixwazin dikin û em ji wan dixwazin ku bi rastî bersiva gelê xwe bin û ji ejendiyên dijminan dûr bikevin, û di çarçoveya kurdewariyê de tev bi hev re bixebetin. Em bi hêvî ne ku tevgera kurdî ya siyasî di asta berpirsyariyê dîrokî de be û têbigihêje ku êdî yekrêziya kurdî pêwîstiyeke hebûnî ye. ■

تَبْنِي ثَوْرَةَ
adopt a revolution



BAWERÎ Û KEVNEŞOPIYÊN GELÊRÎ YÊN BERBELAV DERBARÊ SEDEMÊN NEXWEŞIYAN DE Adil Ibrahim

Nasikirina baweriyên gelêrî der barê sedemên nexweşiyên ên berbelav de, mijareke girîng e, ji ber ku ev bawerî bandorê li reftarê mirovan û jiyana wan a civakî dikin.

Bê guman bijîşkî yek ji zanistên herî kevn e. Bijîşkên berê di ravekirina diyarde û sedemên nexweşiyên de, pirê caran xwe nedispart zanist û ceribandîna lê belê xwe dispartin guman û berjendîna. Nasikirina tekûz a sedemên nexweşiyên, tenê ji du sed salî ve hat piştraskirin. Ew jî piştî ku zanistên bijîşkî û zanistên din bi pêş ketin; her wekî vedîtina mîkroskopî ku bi rêya wan mîkropên ku dibin sedemên nexweşiyên, hatin naskirin û pêşketina kîmyayê hişt ku sedemên nexweşiyên din bihêtin naskirin. Her wiha vedîtina gelek tiştên din jî bandor li vedîtina nexweşiyên kir.

Jîngeh û nexweşî:

Ev li gorî xwediyên vî karî, lê ji bo civakê, babet cuda ye. Civak gelek caran di ravekirina sedemên nexweşiyên de xwe dispêrin agahiyên ku ji dê û bavê xwe girtine bêtî ku belgeyeke zanistî di vê derbarê de li nik wan hebe. Me tevan jî bihîstîye ku gelek kes sedema nexweşiyên li rewşa hewayî, serma, hêma, ba, xwarin û rewşa derûnî vedigerînin. Bê guman her jîngehek xwedî bawerîne taybet e. Niha jî em ê li ser diyardeyên nexweşiyê li cem zaroka biçûk û nerîna civakê û ua zanistê di vê derbarê de, rawestin

1. Weşme:

Ew leke ne ku li ser laşê zaroka nûhatî derdikevin. Navê wê yê inglîzî "Nevus" e. Civak dibêje eger dilê jina ducanî biçê xwarinekê û wê xwarinê nexwe, bandor li zarokê tê kirin û di encamê de

weşmeyer li ser laş wê zarokê derdikeve.

Ev weşme ji aliyê bijîşkî ve encama xestebûna tevî û şaneyên laş e û tu girêdana wê bi xwarin û vexwarinê re nîne.

2. Akzîma zaroka şîrmij:

Civak vê nexweşiya ku li ser rûyê zaroka biçûk dihe der, li qehra dayîka wî vedigerînin; dibêjin dema ku dayîk aciz dibe û di wê acizîya xwe de zaroka xwe şîr dide, ew qehra wê bi rêya şîr li zaroka wê vedigere û ji ber ku zarok tir e, nikare li hemberî wê qehere li ber xwe bide, di encamê de ew qehir dibe weke akzîmayê û li ser rûyê zarokê tê der.

Lê nerîna zanistî di vê babetê de cuda ye, zanist û bijîşk dibînin ku ev nexweşî li hesasiyeta pergala helandinê li hemberî jîngehê vedigere. Ev nexweşî bi şîrê dayîkê yê xwezayî kêma dibe û bi şîrê din zêde dibe.

3. Şîrê dê, rengê çermê zarokê diguherîne:

Civak dibêje eger dê reş be û bav spî be, pêwîst e zarok şîrê dayîka xwe venexwe da ku bi rêya şîr reşbûna dayîkê venegire zarokê.


Zanist vê behaneyê jî red dike û dide diyarkirin ku ji destpêka deqavkirinê (zewacê) ve, taybetmendiyên wîrasî ji dê û bav ber bi zarokê ve tên guhestin û tu têkiliya şîrê dayîkê bi guhestina reşbûnê re nîne.

4. Şîrê dayîka lal zarokê jî lal dike:

Ev yek jî ji hêla zanistî ve nayê pejirandin, ji ber ku şîrê dayîkê nexweşiyên wîrasî venaguhêze zarokê.

Îcar pêwîst e em bi çavekî zanistî li nexweşî û sedemên wan binihêrin, ji ber ku nasikirina sedemên nexweşiyên alîkariyê di xweparastin û nojdarîyê de dike. ■





KURD Û KIRÎVANTÎ

(Beşa duyem)

Salihê Heydo

Xwînerên birêz û birûmet, di beşa borî de me rê û resmên kirîvantiyê di nav kurdan de bi giştî û nemaze li rojavayê Kurdistanê da xuyakirin, lê niha ez dixwazim hinek rê û resmên wê di hinek deverên Kurdistanê de ku hinekî seyr û balkêş in li gor ger û lêkolîna xwe ji we re bînim ser rûpelên kovara Welat weke herêma Şingalê, Nisêbînê, Hekarê, Botanê û Serhedê. Her wiha li cem kurdên li herêma qefqasyayê, kurdên Qaxisistan û Ozbekistanê ku evên dawî bi heyşthezar kîlometran ji welatê bav û kalan, welatê Kurdistanê di riya sûrgûnan re jê dûr bûne bînim ser ziman.

Pîroziya wê li Şengalê:

Li herêma Şengalê bi pîroziyek hîn girantir û watedar lê dinêrin. Hêjayî gotinê ye ku ew dever piraniya wê kurdên êzîdî ne, di gel hindêk kurdên misilman ên sinnî û şîîyên beba û pîrzerê, lewre kirîvantî di navbera wan de hîn xurtir û pîroztir e.

Li gorî rê û resmên kirîvantiyê, netenê peywendiyên civakî û malbatî xurtir dike, lêbelê çênabe kirîv bê şêl (derpê) di ser xanîyê kirîvê xwe re bibore, dema ku bê şêl hilkişê ser xanîyê wî, ew tiştêkî pir guneh û ne li rê dike, û weke sûc û tawanbariya mezin lê dinêrin.

Li Ozbekistan û Qefqasyayê:

Rê û resmên sinetkirinê li nav kurdên Qefqasyayê, wekî kurdên Eremenistan, Gurcistan, Ezirbeycan û Kazaxistanê bi merasîmin pir balkêş û seyr û cuda tene derbirîn û lidarxistinê. Çawa tê zanînê, dema lawik sinet bikin divê ew lawik bi ser lingan ketî be, ango karibe bimeşe. Di wî hingî de wî dişon û vedişon, destek cilên mîrekan yên pir bedew, sipehî û buha lê dîkin, kum û kolozekî didin

serî, çend xizmên wî yên zilam bi destekî wî digirin di gel kincên bedew, çend keç û jinên malbata wî wekî dê, xuşk, xaltîk û kinêz bi destê dîtir digirin, bi wan cilên rengîn û bedew li her kêlekek wî wekî bazekî bi bask tê xuyakirin. Beranekî sorî bi xeml bi xwe re destkêş dîkin. Bi kêf û heytehol, li pêşiya wî li dahol û zirnê didin, jin jî pê re dilîlin û çîndikên şahiyê li xwe dixin heyânî wî digihînin koçka sinetkirinê. Li devê deriyê koçkê wan beranan serjêdîkin û bi dîlokên xweş yên folklorî, jin û mêr, keç û xort li hev

û dû vedigerînin û govendekê digerînin. Her wiha xelat û diyariyan li ser serê wî belav dîkin, pere û diravan jî di gel dana kirîv didin yê sinetçî, û bi pîrozî li kirîv dinêrin. Di roja sinetkirina lawik de her wekî paşe, mîr û axeyekî wî dinimînin û ji zavayekî girantir rûmeta wî digirin. Her wiha dema ku nedrekî didin, divê yekî ku ji Kurdistanê be û sinetkirî be wê pezê serjê bike, ji ber ku ev adetên bav û kalên wan ên Kurdistanê bûn. Lewre li cem wan pîroztir û bixêrtir e, ev yek jî hezkirin û girêdana wan bi welat destnîşan dike.

Li deverên Botan û Çolemergê:

Kirîvantî ji sedsala 19an û şûn de, li van deveran bi vî awayê jêrîn dihat lidarxistin.

Eger yekî bixwesta ku mirovekî jib o xwe bike kirîv, heger her du mirov giregir, mezin û axe bena berî her tiştî hespek bi rex û taxim dixemilandin û dişandin mala kirîvê destnîşankirî bi wateya daxwaza kirîvantiya wî. Wî jî qebûl dîkir û bexşîşek dida wî mirovê ku hesp aniye û bersivek dida ku belê ez ê bibim kirîv.

Lê heger her du mirov ji qata navîn yan jî xizan û hejar bin, mirovê ku doza kirîvantiyê dike beranekî dixemilîne û dişîne mala kirîvê destnîşankirî. Îcarê dibin kirîvên hev. Xwediyên kurên ku bêne sinetkirin amadekariya nan û xwarinê dîkin û xelkê vedixwînin ser. Paşê xwarinê li xelkên derdorê belav dîkin. Piştî ku sinetçî zarokan dibirre, yê kirîv bexşîş û xelata wî dide. dema ku zarok radibin û saxlem dibin, hingî kirîv li gor pêkarîna û hebûna xwe ji wan re destek cil û berg dîkire û dike ber wan. Piştî çend rojan bavê zarokan malbata ewî kirîvî bi jin û mêran ve vedixwîne mala xwe û bi

nan û xwarinê mêvandariya wan dike. Paşê, mêr û jinên kirîvan li gor rewşa xwe xelat û diyariyan didin dê û bavê zarokên sinetkirî.

Hêjayî gotinê ye ku dema malên xizan û belengazan nikaribin zarokên xwe sinet bikin, di wî hingî de axe, malmezin û giregirên wê deverê zarokên wan bi yê xwe re dibirrin da ku xeric û mezaxtinê ji ser wan hilînin, ev jî wekî tiştêkî pîroz û peyar dibînin. Ev kar û barên kirîvantiyê hemî di buharê û serê havînê de dihat lidarxistin, ew jî ji bo saxlemî û tenduristiya zarokan bû.

Li devera Nisêbînê:

Rê û resmên kirîvantiyê li herêma Nisêbînê ji herêmên dîtir hinekî cudatir in. dema ku kirîv destnîşan dikin û roja sinetkirinê hildibijêrin, xaniyekî pir sipehî û bedew bi text û perdeyên neqîşandî wekî çadir û xîfeta maqûl, mîr û şahîşahiyan durist dikin, û cilên pir bedew li lêwîk dikin û wî wekî mîrzadeyan dixemilînin. Jin û mêr bi destê wî digirin û wî li nav bajêr yang und digerin. Piştî ku wî têr digerin tînin male û hemî jin û mêran derdixînin derve, tenê kirîv, bavê kurik û sinetçî dimînin. Paşê wî dibin xîfet û çadira wî, di wî hingî de xwarinê datînin û xandî destpê dikin. Piştî xwarinê dawet û dîlanek bi heylehol li dar dixin û heya êvarî ji hev belav dibin.


Hêjayî gotinê ye ku zarokên kirîvan dibin xuşk û birayên hev û bi hev re noşokîyê nakin û gava ku lawik hewcedarî çî tiştî bibe, kengî be û di çî demê de be, kirîvê wî wekî bavekî yan birayekî mezin jê re dibe alîkar. Her wiha dema kurik mezin dibe û dibe xort û bixwaze yeka xwe bîne, kirîv ji bavê wî pirtir tevdigere, û alîkariyê pê re dike, û her û her li ba hev şêrîn dimînin.

Ez dixwazim di vê derbarê de hinekî ji helbesta Xarîs Bedlîsî ya li ser kirîvantiyê û sinetkirina kurê mîrekî ji mîrekên Bedlîsê bînim ser rûpel ku di sedsala 17an de çî seyr û balkêş e, û çendî mîr giringî dayê û çî şahiya kesnedîtî li dar xistiye ku di dinyayê de tiştêkî wisa

nebûye.

Helbest gelekî dirêj e, tenê ez weke mînak dixwazim parçeyekî jê daxînim bi navnîşana (Badîd û suxen li bezmî xeten) ango dîtin û gotin di şahiya sinetkirinekê de.

Li me'ideba mîr, hatim hizûrê
Xelq diyarîbûn, ji bo tihûrê
Ferzendê biçûk, ew mîrê resen
Ferzendê mîr e, ba bînin xeten
Tev bûk û zerî, xatûn û xanim
Perîzade bûn, ji neslê hakim
Libsê di wana, herîr û dîbac
Zêrê bi wan ve, sed xerc û xerrac
Xuşrên xewatin, siteyle îse
Kerîmê mîr in, mîrê Bedlîs e
Ji tîk hatibûn, lîz û semayê
Bi wê pertewê, bi wê senayê
Rezîm dikutan, feqîh û saxtan
Def û xelîlan, medîh û xweşxan
Ba ev xeten bibe, tev xêr û berket
Bo mîrê biçûk, saxlem be sinet
Pêre dixwendin, sûreyê Qur'an
Tev dû'a go bûn, bo mîrê xîzan
Teyfikên zêrîn, ew cam û ferfûr
Şerbet bi sed reng, celbe bûn ji dûr
Li ser maseyan, goştê koviyan
Falûzîcên qend, bi dest sofîyan
Dengê ney û def, ezman hejandin
Qanûn û çengan, mîrxo firandin
Xîzan û mahewl hemî li hev ket
Roja cemayê, ba in qiyamet
Perrû û xelîet, sed reng û sed gûn
Hemî ji boyî, ferzendê mextûn
Bi kîs û xaban, zêr bûne mesrûf
Roja xitana, sertacê ma'rûf
Lewra mîsal e, ev celeb xeten
Adetê kurd in, bê gef û suxen. ■



قرر الروس إعطاء الكورد حقوقهم فان النظام حتما سوف يوافق عليها .
أما آراس محمد فكان له رأي مختلف حيث قال :

«بالطبع لا يمكن التعويل على الدور الروسي لحماية حقوق الكورد، لأن الروس حلفاء للنظام و لتركيا ويهمهم مصالح النظام السوري و النظام التركي أكثر من مصالح الكورد، كما أنه علينا أن لا ننسى تاريخ علاقة الروس بالكورد و بالقضية الكردية في مهاباد وفي كردستان الحمراء و غيرها و هو تاريخ غير مشجع حيث وقف الروس دوما ضد الحقوق الكردية لذلك لا أظن بأنه يمكن الاعتماد عليهم.»

ولات عوجي و هو مواطن من عامودا له رأي آخر حول هذا الموضوع حيث قال:

يمكن الاعتماد على الروس في الوقت الحالي فهو طرف فاعل في الملف السوري ولديه القدرة على الضغط على النظام في دمشق لإحقاق الحقوق الكردية، لن نحصل على كامل حقوقنا بسبب ما جنيناه على أنفسنا، لكن يمكن تحصيل بعض المكتسبات واتفق مع الرأي الذي يقول ليس علينا قطع علاقتنا مع أمريكا أيضا فهي ما تزال مهيمنة على الوضع والأرض وعلينا فتح بعض القنوات مع تركيا أيضا و الاتفاق على الحد الأدنى لتجنب ما حصل من احتلال في سري كانييه (رأس العين) و كري سبي (تل أبيض) من تطهير عرقي. كما يجب على الحركة السياسية العمل ككتلة واحدة وكخليفة نحل و توحيد الموقف الكردي لانتزاع أكبر قدر من الحقوق المشروعة للشعب الكردي.

جدير بالذكر بأن الغزو التركي الأخير لمناطق (روجآفا) و شمال و شرق سوريا قد خلف كارثة انسانية و موجة نزوح كبيرة من مناطق رأس العين و تل أبيض حيث بلغ عدد النازحين من بيوتهم أكثر من ١٨٠ ألفا يسكن معظمهم الآن في المدارس و المخيمات المحدثّة في مدينة الحسكة و يعيشون ظروفًا بالغة الصعوبة وسط غياب المساعدات الانسانية من قبل المنظمات الدولية، كما نزح العديد من سكان المنطقة الى اقليم كردستان العراق خوفا من الهجمات التركية و فوائل المعارضة السورية الموالية لها.

مع انتهاء تنظيم داعش تأمل سكان (روجآفا) شمال و شرق سوريا العيش بسلام و طمأنينة بعد أن قدموا آلاف الشهداء و الضحايا دفاعا عن مناطقهم و في حربهم ضد داعش، لكن القوى الاقليمية و المحلية لم يرق لها أن تنعم المنطقة بالأمن و السلام فذهبت تحيك المؤامرات و الخطط من أجل تدمير المنطقة و تشريد سكانها.

و وسط الصفقات الاقليمية و الدولية و التهديدات التركية و تهديدات النظام السوري لايزال مصير مناطق شمال و شرق سوريا مجهولا .



هل يمكن الاعتماد على الروس لضمان الحقوق الكردية؟

تقرير مجلة ولات

بدأت

ولتنفيذ تلك الاتفاقية بدأت دوريات عسكرية روسية تركية تتجول في قرى ومدن كردية للتأكد من اخلاء تلك المناطق من قوات سوريا الديمقراطية، كما تم أنتشار مجموعات من قوات الهجانة التابعة للدولة السورية على طول الحدود.

ناهيك عن انشاء نقاط روسية في بعض المدن الكردية.

لكن السؤال الذي يطرح نفسه هل سيكون الروس ضامين لعودة الأمن والاستقرار الى هذه المناطق وهل سيضمنون الحقوق الكردية بالضغط على الحكومة السورية؟

لسماع آراء الناس حول هذا الموضوع أجرت مجلة ولات هذا الاستطلاع في مدينة عامودا .

(كاوا نهيت) مواطن من مدينة عامودا تحدث لمجلتنا و قال:

«أنا متفائل بأن الروس سيكون لهم دور كبير في ضمان الحقوق الكردية لانهم يستطيعون الضغط على الحكومة السورية ،فكافة أوراق الملف السوري أصبحت بيدها فاذا

القوات الروسية والسورية انتشارها في المناطق الكردية في (روجآفا) و شمال شرق سوريا بعد انسحاب القوات الأمريكية المتهمة بالخيانة من قبل الكرد الذين ضحوا بألاف الشهداء في حربهم المشتركة مع التحالف الدولي ضد داعش وساهموا في القضاء على أكبر تنظيم إرهابي دولي وذلك بعد إعطاء الامريكيين الضوء الأخضر لتركيا لاحتلال مناطق جديدة من روجآفا ومنها رأس العين (سري كانييه) و تل أبيض (كري سبي) و ارتكاب أفظع الجرائم بحق سكانها كما ساهم الغزو التركي الذي اعتمد على ما يسمى بالجيش الوطني التابع لتركيا الى تهجير الآلاف من سكان تلك المناطق بهدف تغيير ديموغرافيتها.

قرار دونالد ترامب بسحب قواته من سوريا جاء لصالح روسيا التي دخلت على الخط و دعت الرئيس التركي إلى روسيا و أبرمت معه اتفاقا يقضي بإبعاد قوات سوريا الديمقراطية مسافة ٣٠ كيلو متر عن الحدود التركية السورية خلال فترة زمنية محددة شريطة وقف العدوان التركي على المنطقة.

تتمة المقال على الصفحة ٦



- يقول البعض أن المرحلة الواقعية في الرسم هي جسر العبور نحو المذاهب و الأساليب الفنية الأخرى و يجب على كل فنان حقيقي أن يبدأ من هذه المرحلة، فهل تفكرون في العبور من الواقعية الى اتجاهات الفن الأخرى؟

- الفن الواقعي ليس بالمرحلة ولا هو مقدمة لأي فن أو اسلوب آخر وباعتقادي أنه فن واسلوب قائم بذاته يمتلك كل عناصر التشكيل والتعبير الفني ، أما تعلم فن الرسم واساسياته فهو بكل تأكيد يصلح لأن يكون مقدمة ومرحلة أولية لأي أسلوب آخر ومنها الأسلوب الواقعي الذي هو نقل أمين للواقع مضافا إليه حس الفنان وشعوره وهذه هي نقطة الاختلاف بين فن الرسم والفن الواقعي .

أما بالنسبة لمسألة العبور إلى اتجاه آخر فأنا أفضل تسمية تغيير الاتجاه بدلاً من العبور وهو أمر ممكن الحدوث إذا استهوتني اي من المدارس الفنية الأخرى وهذا الامر يأتي تلقائيا وليس بقرار شخصي ، فأنا لا ابحث عن أسلوب يميزني ، بل إن نتاجي إذا كان نابعا من ذاتي بصدق ودون تصنع سيكون متميزا بلا شك .

- هناك من يقول أيضا أن المذهب الواقعي في الفن أصبح قديما و لا يملك القدرة التعبيرية التي تعبر عن آلام و هموم الانسان المعاصر و أن عدد فنانين المذهب الواقعي في تناقص، ما رأيكم في هذا الكلام ؟

- المذهب الواقعي في زمن عصر التنوير يسمى الآن الكلاسيكية وصفة القدم تستطيع أن تطلقها الآن على معظم المذاهب الفنية الأخرى فالكثير منها مضى عليها أكثر من قرن وأصبحت قديمة بدورها ومع ذلك يطلق عليها في بلداننا بالمدارس الحديثة .

والواقعية هي من أقدم المدارس الفنية هذا صحيح والتمكن منها يحتاج إلى جهد وصبر كبيرين وأدوات عديدة وهي من أكثر المدارس التي يُنظر إليها على أنها رجعية ولا تفي باحتياجات التعبير عن هموم الإنسان في العصر الحالي ، ولكن هناك ما يخالف هذا الرأي فالواقعية لم

تمة المقال على الصفحة ١٠



- كيف تختارون مواضيع لوحاتكم و الى أي حد تهتمون بالبعد النفسي و التعبيري للعمل الفني ؟

- في البداية عند اختيار موضوع ما يستهويني ويسيطر على تفكيري لون ما أو شكل ما أو عنصر ما في وضعية معينة ثم أقوم بالبحث عنه في الموجودات والعناصر المتوفرة وأعتبر هذه العملية كجزء من البعد النفسي والتعبيري لمنتجتي التشكيلي فعندما أرسم قنديلا أو قطعة خبز فهذه العناصر لها تأثير نفسي علي وعلى المتلقي أما البعد التعبيري فيظهر عندما أعبر عن هذا العنصر أو ذاك بصدق وأن أعرف المتلقي كيف أشعر به وكيف أراه وهو ككل احساسي انقله للمتلقي عن طريق ما أرسمه .

- تمتاز لوحاتكم بدرجة عالية جدا من الاتقان سواء أعمالكم بقلم الرصاص أو بالألوان الزيتية، كيف تستطيعون تحقيق ذلك و الى ماذا يحتاج الفنان كي يصل الى هذه الدرجة العالية من الاتقان ؟

- الإتقان يأتي بامتلاك أدوات المعرفة النظرية والعملية للوصول إلى درجة الاحتراف ، وأي إنسان يريد أن يتقن رسم الواقع لا بد أن يكون صبورا ومراقبا جيدا لما يريد أن يرسمه ويجب عليه أن يتعلم كيفية النظر الصحيح وفهم هندسة أي تكوين أو تشريح ، فالإتقان لا يأتي اعتباطيا بل هو نتيجة لتراكم الخبرات والتجارب الكثيرة والطويلة.

والخامات كلها تحتاج لمجمل هذه الأمور سواء كانت خامة الألوان الزيتية أو قلم الرصاص أو أي خامة أخرى مع اختلاف التعامل مع كل خامة وتكنيكها الخاص بها .



أكرم بكر :

حاوره : عمران يوسف

«الواقعية لم تفقد بريقها عبر
العصور والكثير من اللوحات الخالدة
مرسومة بأسلوب واقعي»

-لنبدأ بالسؤال الذي قد يبدو تقليدياً ما الذي جعلكم تخوضون
معتزك الفن و كيف كانت البدايات ؟

-التساؤل عن سبب خوض معتزك ما ربما يستلزم العودة إلى
البدايات ، لنقل إنه ميل ما إلى الشكل واللون فالموجودات
من حولي كانت أشكالها وألوانها تستهويني وكنت أحاول نقل
بهجتها بعد أن تنطبع في مخيلتي على أي سطح قابل للرسم
كالورق والجدران ... وحتى أحيانا كنت أرسمها في الهواء باليد .

تلك كانت البداية ويأتي أيضاً دور من يحيطون بك وشعورهم
بشغفك الذي لا بد وأن يظهر بطبيعة الحال ومقدار تفاعلهم
مع ما تقوم به بشكل إيجابي من تشجيع ومساعدة وتوفير لما
تحتاجه ، وأنا كنت محظوظاً بالأصدقاء والأهل الذين قدموا لي
مشكورين كل ما كانوا يستطيعون تقديمه لي .

-يمتاز أسلوبكم الفني بالواقعية الشديدة لدرجة أن لوحاتكم تكاد
تكون تصويراً فوتوغرافياً عن الواقع، لماذا اخترتم هذا المذهب
في الفن ؟

- الأسلوب الذي أمارسه نعم انه يمتاز بالواقعية ولا أدري إذا كان
واقعية شديدة أم لا ، فالواقعية لها عدة درجات فهناك أسلوب

واقعي يمتاز بالخشونة نوعاً ما وهو قريب للأسلوب
الانطباعي وهناك من يكتفي بنقل الشكل واللون بدون
الخوض في التفاصيل وهناك أسلوب السوبرياليزم أو الواقعية
الخارقة وهو يعنى بتفاصيل التفاصيل وهكذا ...

وبكل الأحوال أنا أصنف نفسي كواقعي ولكني لا أميل إلى
الصورة الفوتوغرافية ، فأنا أرى بأن اللوحة الواقعية تختلف
كثيراً عن الصورة الفوتوغرافية فاللوحة الواقعية تحتوي روح
الفنان مهما كان كانت درجة نقله للمشاهد دقيقة .

تتمة المقال على الصفحة ٨

أكرم بكر :

- إجازة في الإعلام من جامعة دمشق ٢٠٠٧

- درس الرسم والتصوير الزيتي في مركز صبري روفائيل للفنون التشكيلية

- شارك في العديد من المعارض الجماعية في مدينتي الحسكة والقامشلي



- معرض فردي في ثقافي الحسكة ٢٠١٧



- ما هي مشاريعكم المستقبلية في مجال الفن ؟
- لا مشاريع جديدة في الأفق سوى أن يُتاح لي المزيد من الوقت والقدرة البدنية والأدوات اللازمة والهدوء لممارسة وإنتاج المزيد من الأعمال فالاستمرارية هي ما تنتج آفاقاً جديدة .
- كلمة أخيرة؟
- كل الشكر والتقدير لمجلتكم الغراء على اهتمامها بالحركة الفنية ومن يمارسون الفن . ■

تفقد بريقها عبر العصور والكثير من اللوحات الخالدة مرسومة بأسلوب واقعي، والواقع هو ما يقدم الأساس لأي مذهب أو مدرسة فنية أخرى.

أما من ناحية امتلاكها للقدرة التعبيرية عن هموم الإنسان المعاصر فهي بكل تأكيد - إذا كان من يزاولها فناناً حقيقي - يستطيع أن يعبر بها عن كل لواعج وآلام وهموم النفس البشرية في كل العصور والأمكنة . إنها أسلوب والأسلوب أداة قد تناسب البعض ولا تناسب البعض الآخر ، أما القول بأن فنان المذهب الواقعي في تناقص فأنا اعتقد بأنه في العصر الراهن هناك رجوع نحو المذهب الواقعي في الكثير من الأوساط والاكاديميات والمراكز العالمية الفنية بعد الابتذال الذي وصلت إليه بعض التيارات والمذاهب الفنية الأخرى واعتلاء سدتها الكثير من المغامرين الذين تنقصهم المعرفة الكافية .



-الكثير من الذين يدعون بأنهم فنانين يقفزون على المرحلة الواقعية في الفن و يتخذون لنفسهم مذهباً متقدماً على الواقعية و البعض منهم يكتسب الشهرة، ماذا تقول عن هؤلاء؟

- ليس مطلوباً من كل فنان أن يتقن الفن الواقعي والأمثلة كثيرة على فنانين كبار لم تكن لديهم خبرة كبيرة في هذا الفن وإنما المطلوب فهمه وإدراكه لما يقوم به وإدراك ماهية الفن بشكل عام وأن يكون على دراية كاملة بأسس العمل الفني وأن تكون لديه تراكمية بصرية ومعرفية جيدة بالمدارس الأخرى ، فهذه المدارس وأن كانت تميل نحو التبسيط إلا أنها لا تقل تعقيداً عن الفن الواقعي فهي تحتاج إلى عمق معرفي وبصري كبير وهي مدارس من الصعب الخوض في غمارها بدون الفهم والادراك لكل أساسيات التشكيل الفني .

-هناك من يقول بمبدأ الفن من أجل الفن و البعض الآخر يقول بأن الفن رسالة ، باعتقادكم كيف يمكن أن يؤثر الفن ؟

- الفن لغة استخدمها الإنسان لترجمة التعابير التي ترد في ذاته الجوهرية وليس تعبيراً عن حاجة الإنسان لمطالبات حياتية ، والفنان الحقيقي هو شخص مبدع ومتمكن من أدواته الفنية يسخرها لخدمة مجتمعه ولديه الوعي لاستخدام إمكاناته لتطويع هذا المجتمع وهو بذلك يكون مؤثراً وفعالاً بصدق ومقدار جديته .

XARÎS BEDLÎSÎ

Hinek lêkoler dibêjin ku navê wî Haris e, ne Xarîs e, her wiha di der barê jidayikbûna wî de jî sê gotin hene, hinek dibêjin ew sala 1700 Z ji dayik bûye, hinek jî dibêjin ku ew sala 1733an ji dayik bûye, gotina sêyem dibêje ku ew sala 1758an ji dayik bûye, lê ev gotina dawî cihê nakokiyê ye, çimkî wekî ku hatiye nivîsîn ku Xarîs sala 1758an dastana (Leyla û Mecnûn) nivîsiye, îcar nabe ku di heman salê de jî ji dayik bûbe, lê her kes dibêje ku ew li Bedlîsê hatiye dinyê, ji lewera navê wî bûye Xarîsê Bedlîsî.

Torevanê kurd Xarîs Bedlîsî Ji bilî nivîsa helbestê du dastanên giranbûha nivîsîne, ew jî dastana (Ûsif û Zelîxe) û dastana (Leyla û Mecnûn) in.

Dastana (Ûsif û Zelîxe) berê (Selîm Suleyman) nivîsîbû, lê Xarîs nivîsa wî wergerand zimanê kurdî piştî ku gotinên erebî û farisî ji nav derxistin, û bi zimanekî kurdî yê pir xweş û zelal nivîsiye.

Di sedsala hîjdeh û nozdehan de dastana (Ûsif û Zelîxe) ya Xarîs li dibistanên kurdan dihate xwendin, çimkî zimanê wê pir pak û zelal bû û baş dihate fêmkirin.

Sala 1965an M.B.Rûdenko destnivîsa (Leyla û Mecnûn) ya Xarîs Bedlîsî çap kiriye, di pêşgotina xwe de dibêje ku Xarîs ev dastan li ser xwesteke keçeke kurd nivîsiye, ku vê keçê ji xarîs xwestiye ku vê dastanê ji farisî wergerîne zimanê kurdî da ku bête fêmkirin, çimkî wê zimanê farisî nizanîbû.

M.B.Rûdenko diyar nekiriya ka Xarîs dastana (Leyla û Mecnûn) ji kîjan jêderê wergerandiye lê tête diyarkirin ku wî ji nivîsa Nizamî biriye û gelek guhertin tê de kiriye.

Li gorî Ibin Betûta, koçerên kurd ev dastan ji devê ereban girtiye û bi vî awayî di nav wan de belav bûye, û bi zimana kurdî dihate gotin, û ew ji Xarîs re bû bingeh û jêdera nivîsa dastana (Leyla û Mecnûn)

Ji bilî her du dastanan, gelek helbestên Xarîs Bedlîsê hene.

Di der barê koça torevanê hêja Xarîs Bedlîsî de ti agahiyên tekûz nîn in. ■



هذه الظروف يمكننا من تحسين سلوك الطفل و تغيير مجرى و اتجاه سلوكه.

و لكن هذا لايعني بأنك أنت من يتحمل وزر طفلك الذي يتصرف تصرفات غير مقبولة. فالعوامل الوراثية تلعب دورا في تعرضه لمشاكل أكثر.

و طبعا ينطبق الأمر ذاته على العوامل التي يتعرض لها الطفل سبب طريقة تعامل الوالدين و بسبب الاجهاد الذي يتعرض له الطفل في حياته المبكرة.

فقد يبرمج الإجهاد و الضغط النفسي الذي يتعرض له الأطفال خلال طفولتهم الطريقة التي تعمل بها وظائف الجينات و حتى أن الطفل ينقل هذه البرمجة للجيل التالي.

فقد يرث الطفل جينات معينة غير مفعلة بسبب الضغوط التي تعرض له والداه في مرحلة الطفولة و أورثوها لطفله. هذه الجينات الغير مفعلة تلعب دورا سلبيا في سلوك الطفل في الجيل الثاني.

يتابع البروفسور كفين:

يتأثر العنف عند الأطفال أيضا بقوة بيئة خارج البيت. فالأقران و المعلمين و الجيران و الإعلام و الإيديولوجيات و العوامل الثقافية مجتمعة تلعب دورا.

و يتنوع تأثير هذه العوامل البيئة على الطفل وفقا لجينات الطفل و تربية الوالدين و تعرض الطفل للضغط النفسي المبكر.

تشير الدراسات إلى أن بعض الأطفال لا يرتفع عندهم هرمون الإجهاد الكورتيزول بشكل طبيعي عندما يواجهون مواقف عصيبة. و قد يواجه البعض الآخر من الأطفال زيادة كبيرة في هرمون الإجهاد الكورتيزول، لكنهم يستغرقون وقتاً طويلاً غير طبيعياً للتعافي.

و مهما تكن العوامل التي تعرّض الطفل للمخاطر فإن ذلك لا يعني أن النتائج السلبية حتمية و لا يمكن تفاديها

فيمكن أن يكون للمربين تأثيرا إيجابيا هاما إن تلقوا المساعدة التي يحتاجونها. حيث أظهرت الدراسات العشوائية و التي تم التحقق من صحتها أن بمقدور المربين توجيه مسار العدوانية و العنف عند الأطفال إذا ما تلقوا تدريبا عمليا و دعما معنوياً. أظهرت هذه الدراسات بأن التدخل في توجيه مسار العنف عند الأطفال حقق النتائج بعد أن تعلم الوالدان أساليب التعامل مع العنف، من جهة. و من جهة أخرى أثمرت هذه التدخلات في تغيير نظرة و توقعات المربين (الوالدين) تجاه التعامل مع العنف عند الأطفال.

فغالبا ما يتوقع الوالدان أن يولد الطفل هادئا عاقلا دون مشاكل و يستجيب لأوامر الوالدين دون نقاش. و لكن الواقع مغاير تماما

لهذه النظرة المسبقة و التوقعات بخلو تربية الأطفال من أية مشاكل.

لا يخفى أن الكفاح في حل مشاكل سلوك الطفل مرهق و مُحِيط للوالدين. فهي تستنزف مرونتهم وشعورهم بالتفاؤل و كفاءتهم و حسن النية التي يحملانها تجاه طفلهم. حتى أن هذا يمكن أن يعيد تعريف العلاقة بين الوالدين والطفل بطريقة مدمرة ، و قد يدفعك هذا الصراع مع سلوك طفلك بالتفكير بطريقة مغايرة قد تقوض قدرتك على التكيف. فالأفكار العقيمة السابقة عند الوالدين تجاه سلوك الطفل العدواني تسعّر و تغذي الصراع بين الوالدين و سلوك الطفل العنيف وتجعل مشاكل السلوك عند طفلهم أسوأ.

و لهذا من المهم جدا أن تستبدل عزيري الوالد و الوالدة طريقة التفكير السامة التي تعودت عليها بأفكار إيجابية وبناءة تساعد في حل المشكلات و تساعد في إيقاف السلوك السيئ قبل أن يثور. و هذا ما يسمى بتغيير توقعاتك و نظرتك تجاه سلوك الطفل!

لذا، سواء أكان الأطفال يجتازون محنة أو يعانون من مشاكل أكثر صعوبة، فيجب علينا أن نتحمس لمواجهةها بكل صبر و أناة و حكمة متسلحين بالأدوات المناسبة لتغيير الأمور لصالحنا.

عزيزتي الأم و عزيري الأب، صحتك النفسية لا يجب أن يحتل مكانا ثانويا من اهتماماتك و لا يتحمل التأجيل إلى ما بعد أن تحل مشاكل سلوك طفلك. فصحتك النفسية قضية هامة و مستعجلة و تلعب دورا مركزيا في هذه الأزمة. ■



العنف لدى الأطفال .. أسبابه و أساليب التعامل

معها

هिला محمد

أكبر من طاقته في كيفية التعامل معها.

فالأطفال الذين يواجهون مشاكل أكبر منهم يميلون إلى العدوانية كنتيجة لإحباطهم في مواجهة هذه المشاكل. فهم لم يتعلموا بعد كيف يتحكمون باندفاعاتهم أو لم يتعلموا كيف يحلون النزاعات مع أقرانهم بطريقة مقبولة اجتماعيا.

و قد يصارع الطفل في بعض الحالات صعوبات خاصة مثل: احداث الحياة العصبية، و مشاكل تتعلق بالتنظيم العاطفي أو اضطراب نقص الانتباه أو علامات التوحد أو فرط النشاط.

ومع ذلك، و في جميع الحالات العصبية التي يمر بها الطفل - حتى عندما يتم تشخيص الأطفال باضطرابات سلوكية خطيرة- يمكن للبالغين أن يكون لهم تأثير قوي في مساعدة الطفل.

لا يحدث العنف لأننا مبرمجون علي الاستجابة للعالم الخارجي بعدوانية فكلنا لدينا المقدرة على التصرف بعدوانية. و لكن استجابتنا للعنف من عدمه يتوقف على منظورنا للعالم الخارجي.

و لكن ماذا يشكل منظورنا للعالم الخارجي كأطفال و بالتالي استجابتنا لهذا العالم؟

يتابع البروفسور *كفين ديفار*:

تشكل الميول العدوانية عند الطفل بسبب الظروف البيئية، أو الضغوطات أو التهديدات أو الفرص أو نتيجة العواقب التي يختبرها الطفل. و بتغيير

قد تصدم إذا ما علمت أن العنف و العدوانية يشكل جزءا طبيعيا من تطور الطفل. فالكثير من الأطفال يستولون على ألعاب أصدقاء الصف و يضربون و يرفسون بعضهم البعض و يصرخون حتى تزرق وجوههم من حين لآخر. عندما يكون الأطفال الصغار في طور تعلم كل أنواع المهارات الجديدة ابتداء من استعمال المقص الى التحدث بجمل طويلة، فمن السهل أن يشعروا بالإحباط من الفشل في انجاز هذه المهام بحيث ينتهي المطاف بالطفل بأن يضرب رفيقه الذي يشاركه اللعب.

و الطفل الذي بدأ يداوم في الروضة و أصبح لزاما عليه أن يتعود على الابتعاد عن البيت، إن شعر بالاستياء و الإهمال فوق بقية الهموم الأخرى، فليس غريبا أن ينتقم من الطفل الذي بجواره الذي يزعجه و يقوم بدفعه بقوة. أحيانا أخرى قد يكون طفلك جائعا أو متعبا و لا يستطيع أن يتعامل مع هذه الشعور فيقوم بالعض أو الضرب أو يدخل في نوبة غضب.

أسباب العنف عند الأطفال حسب البروفيسور *كفين ديفان*:

قد يواجه حتى الأطفال الأكبر عمرا و طلاب المدرسة الابتدائية صعوبات في التحكم بمزاجهم. و يمكن أن تعقد إحدى المشاكل في التعلم في المدرسة على الطفل الاستماع أو التركيز أو القراءة و بالتالي تعيقه عن انجاز واجباته المدرسية مسببة له احباطا لا ينتهي. و قد تثير أي صدمة نفسية في العائلة (كانفصال الوالدين أو مرض أحد أعضاء العائلة) الأذى و الغضب في نفس الطفل



KOÇBERÊN SERÊKANIYÊ Û HÊVIYA VEGERÊ



Efsan Kurdî

Bi destpêkirina êrîşên dewleta tirk û çeteyên bi ser ve ku navê (artêşa niştimanî) li xwe dikin li ser Rojavayê kurdistanê, ku li jêr navê (kaniya aştîyê) destpê bû, aştî û aramiya deverê bi temamî têkçû, û li şûna ku ev operasyon ewlehiyê îne deverê wekî ku serokkomarê Turkiyê ragihand, wêranî û talanî bi xwe re anî devera aram, di encamê de bi hezaran niştociyên Serê Kaniyê û Girê Spî dev ji cih û warên xwe berdan û koçber bûn.

Bombebarana firokeyên cengî, û topbarana topan li gel tawanên çeteyên radîkal û terrorist ên ku ti nirxên mirovî nasnakîni hişt ku bingeha jiyane li deverê têkbiçe, lewa xelkên deverê û bi taybetî kurd ji bo parastina jiyana xwe û jiyana zarokên xwe mal û milkê xwe hiştin û ber bi deverên aram ve derketin.

Bi hezaran xelkên Serêkaniyê û Girê Sipî li bajar û bajorêkên rojavayê Kurdistanê di rewşeke dijwar de jiyana dikin. Beşek ji wan di kampên penabertiyê de hatine bicih kirin mîna kampa Waşûkanî ya li bajarê Heseke, beşek din jî li dibistanên Heseke û Qamişlo hatine bicihkirin, beşeke din koçberî başûrê kurdistanê bûne. Û hinek malbatan li bajarên Qamişlo, Amûdê, Tiltemir, Heseke û hin deverên din xanî kirê kirine.

Ji bo şopandina rewşa penaberên Serêkaniyê û Girê Sipî, kovara Welat hevdîtîni bi çend malbatên ku li Amûdê bicih bûne kir û ev rapor amade kir. Bavê Dilo welatîyek ji gundê Hwêşa yê bi ser

bajarê Serêkaniyê ve ye, ku dikeve navbera bajarê Serêkaniyê û bajarokê Tiltemir de, niha ew li Amûde koçber e. Bavê Dilo ji kovara welat re axivî û got:

“Piştî ku êrîşa dewleta turk û çeteyên bi ser ve li ser devera Serêkaniyê destpêkir û piştî xiyaneta Emerîkayê bi me re û vekîşandina wê ji deverê, û li paş perdeya bêdengiya dewletên cîhanê, hêzên erîşker û dagîrker hemû şeweyên qirkirinê û cenûsaydê li dijî xelkên deverê bikar anîn, lewra em jî wek xelkên serê kaniyê neçarbûn ku ji cih û ji warê xwe koçberbibin da ku em jiyana zarok, jin û xiznên xwe ji hovîtiya dagîrkeran biparêzin.”

Bavê Dilo bi dilekî bi şewat gotina xwe didomîne û dibêje:

“Ez xwedî xîzan im, malbata min hemû koçber bûn, em niha li Amûdê dijîn di xaniyên kirê de ne. rewşa me gelek xirab e. debara jiyana mebi xêra çandiniyê bû, lê ew jî çû. Erd û zeviyên me ji destê me derxistin û îroj di bin destê çetan de ye. Derfetên kar jî niha li vir û di vê rewşa abûrî ya zehmet de peyda nabin.

Tenê hêviya me ew e ku zû vegerin gundê xwe ser mal û melkên xwe, û bi aştî û aramî li welatê xwe jiyana bikin.”

Mehmûd Nihyet ku ew jî yek ji xelkên Serêkaniyê ye, ji taxa Xerabat e, û ji ber êrîşa artêşa Turkiyê û çeteyên bi ser ve koçberî bajarê Amûdê bûye, Nihyet derbarê rewşa jiyana xwe ya niha ji kovara Welat re axivî û got:

“Ez ji serê kaniyê me ji taxa Xerabat im, em ji ber şer reviyana û niha li bajarê Amûdê dijîn. Çeteyên ku bi artêşa Turkiyê re derbasî Serêkaniyê dest danîne ser xaniyê min û yê birayê min, li gor hin cîranên me yên Serêkaniyê ji me re tekez kirin ku çekdaran hemû kel û pel û xiradên di mala me de bûn dizîn û di xaniyên me de bi cih bûne.


Me xwest ku em vegerin malên xwe, lê bi hebûna wan çeteyan veger zehmet e, ew kurdan armanc digirin, wan digirin û direvînin û doza gelek pereyan li hember berdana wan dikin, aramî li Serêkaniyê nemaye.

Jiyana koçberiyê pir dijwar e, wek hûn dibînin em di xaniyê kirê de ne, û bi hezaran penaberên Serêkaniyê îro roj di kampa de dijîn, Em dixwazin vegerin warê xwe, em banga xwe digihînin hemû dewletan û sazîyên mirovî ku alîkariya me bikin da ku em vegerin cih û ware xwe.”



FERHENGOK

rêberr- çete	قاطع طريق
talan	النهب و السلب
destdirêjî	اغتصاب
binpêkirin	انتهاكات
tundûtîjî	عنف
wêran kirin	تخريب
tawanbar	مجرم
kujer	قاتل
sûc	ذنب
sûcdar	مذنب
tawan	جريمة
guneh	خطيئة
gunehkar	خطاء
çekdar	مسلح
kurtêlxwer	مرتزق
nankor	ناكر الجميل
sîxur	جاسوس
berevanî	دفاع
rewa	مشروع - شرعي
belgekirin	توثيق



وهي العاصمة واشوكاني waşkanî ومن خلالها كان يتمّ التحكّم بالدولة الميئانيّ
2= المرحلة الآشورية بعد سيطرت الجيوش الآشورية على المنطقة تم تسميتها غوزانا وذلك في عهد الملك الآشوري

داد نيراري الأول الذي دام حكمه بين عامي (١٢٧٤-١٣٠٥ ق. م.).

٣- المرحلة الرومانية سميت المدينة رسين وتيودسليوس .

٤- مرحلة العصر الإسلامي والعربي سميت برأس العين.

اما من الناحية الجغرافية التاريخية كانت تعد موقعا مهما من الناحية التجارية حيث كانت بوابة بين الشمال و الجنوب و محطة للقوافل التجارية و أخذت خصوصيتها في العصر العباسي و كانت محطة استراحة لدى الأمراء و الخلفاء العباسيين و يذكر بان في عهد الناصر صلاح الدين الأيوبي بقي عاما كاملا في المدينة إثناء معاركه مع الصليبيين في المنطقة الشمالية من سوريا

العهد الجديد المدينة سري كاني Serêkaniyê

بعد اتفاقية لوزان تجزأت مدينة سركاني ك غيرها من المناطق الكردية بين طرفي الحدود , الشطر الشمالي من نصيب كردستان الشمالية وسمتها الدولة التركية بجيلانيينار أي غزال الربيع , اما الجزء الجنوبي اصبح تحت سيطرة الدولة السورية و ستمتها السلطات فيما بعد رأس العين الترجمة الحرفية لاسمها الأصلي Serêkaniyê .



مدينة سري كاني بين الماضي والحاضر

كلال كاساني

لجذب السياح الأجانب و كذلك أبناء المحافظات الأخرى وذلك بقصد المعالجة أو الترفيه والاستجمام.

كما أن مدينة سري كانية تتميز بموقعها الجغرافي و الأثري و التاريخي.

من الناحية الأثرية و التاريخية تمتد جذور نشأتها في دروب التاريخ إلى خمسة آلاف سنة فهي ذاكرة تختزن فيها تاريخ العصور و المراحل الغابرة , لقد كانت المدينة عاصمة الإمبراطورية الميتانية و كانت تسمى في ذاك الزمان ب واشوكاني (Waşokanî).

مرت مدينة سري كانية (Serkaniyê) بأربع مراحل جدا مهمة حيث طرأت من خلالها تغيرات بنيوية من أهمها اسمها الأساسي وذلك حسب المرحلة و القوى التي اغتصبت الأرض من أصحابها الأصليين وهم الميتانيين الكرد كما ذكرنا انفا.

في القرن السادس عشر قبل الميلاد , بدأ اسم الميتانيين بالبروز و كانت عاصمتها واشوكاني = آ ش كاني و موقعها تل الفخيرية على نهر الخابور شرقي تل حلف في منطقة سري كانيه الكرديّة .

كانت تمتدّ الدولة الميتانيّة من إمارة «شي» شمال مدينة آمد (دياربكر) الكرديّة في كردستان الشماليّة إلى إمارة يحاض =محض و كان مركزها حلبا=حلب إلى إمارة الأлах=الأخ في تل العطشانيّة عند سهل إنطاكيّة و إمارة مركيش شمال مدينة حماه أي أن الدولة الميتانيّة شملت غربي كردستان وتوسّعت باتجاه المناطق الأخرى.

إذاً الدولة الميتانيّة كانت مجموعة من الإمارات , لديها مركز

تعتبر مدينة سري كاني (Serkaniyê) من المدن الكبرى في روجاني كردستان تبعد عن مدينة قامشلو حوالي 90 كم ويعيش فيها قرابة ٢٠٠ ألف شخص حسب إحصائيات مركز الدراسات و الأبحاث العربية عام ٢٠١١.

يعيش في المدينة مكونات مختلفة من الشعب السوري من الكرد وهم السكان الأصليين و العرب و الأشور و الكلدان و الجركس و الشيشان حيث ينتشر بينهم التالف و الود و تربطهم علاقات حسن الجيرة و المحبة القائمة على احترام خصوصية الآخر, لم تشهد المدينة يوما تعاركا او تشاجرا بسبب الانتماء القومي و العرقي كلهم متحابون و يعيشون بؤام والسلام . تتميز مدينة سري كانية (Serkaniyê) بجمال طبيعتها الخلابة حيث الينابيع الدافقة تطري بها النفوس وكانت تقدر عددها قديما بثلاثمائة ينبوع . حسب ما روى يافوت الحموي في كتابه قاموس البلدان أن الينابيع المشهورة هي عين الآس وعين الصرار وعين الرياحية وعين الهاشمية ولكن في وقتنا الحاضر اشهر هذه الينابيع النبع الكبرى حيث كان مصدرا مهما



DIYARÎ BO GIYANÊ HELESTVAN YÛSIVÊ BERAZÎ (BÊBUHAR)



Anahîta Sîno




Hebs û zindan kûr û tarî
Îşev ewê xewa te bê
Te karî bû bi leşkeran
Qey zor bûn leşkerên xwedê

Bavê Xisro tu bi kud çû
Li pê îzrayîl tu ket rê
Gelek caran te digo na
Çima ev car te go erê

Li nav bexçê Serê Kaniyê
Digrî gulîzar û gewrê
Çawa destê te ji wan bû
Wan hişt û berî da gorê

Tenbûr û ew hilbestên te
Li te digerin li nav xelkê
Por jêkirin rû qelaştin
Dizanin qet nema tu tê

Lokê qemer tu rêber bû
Di hestan de li vê jînê
Mafê te qet ne gîha te
Wê bighê te pişt mirinê ■



دموع الخطايا

فرهاد عجمو ترجمة عن الكردية: عمران يوسف

انهمري يا دموعي
انهمري
ربيبي كان جريحا
رحل بلا زهور
صيفي
كنزجة عطشى و يابسة
أحنت رأسها
أنا و غيوم هذا الخريف
تقاسمنا الدموع و المطر.
شتائي الظالم
حمل لي الثلج و العواصف
بهذا الحمل
كيف لي أن أصل الأرجاء ..
بهذا الحال
لماذا أوقظ العاشقين من سباتهم.
حكايتي منذ البداية
دمعتان
تتدحرجان على الوجوه
فانهمري من هذه العيون
انهمري

فلتنهمري
من ينبوع العيون الخجولة
من أماني زين و شيرين (1)
من الآمال ...
من الجراح...
من شواهد قبور الذكريات
فلتنهمري
من أنين تلك النيات
من حول بردايات (2)،
تلك الطنبورات (3) ...
من سيان (4)، ثلج الأمنيات
على خيوط الجدائل
فلتنهمري
يا دموعي
انهمري ...
شتاءات و خريف القلب
بلا ربيع
فانهمري كعواصف المطر
انهمري ...
انهمري ...
على أثر تلك القوافل.
من المهد
أنا عابر سيل
من ظلمة العدم
خرجت
عن حضن الحياة و الحب
ابتعدت
كم ألف جرح ...؟
كم ألف ألم ...؟
رويبتها لنفسى بالدموع.
وجوه الورود ترتجف
تأن
تتاوه
أمام رياح موجة الألم.
آمال القلب
على وجوه غيمات الأماني
تصرخ
تستنجد ..
في القلب الحزين
الجراح و الآلام
لم تعد تحصى.
فلتنهمري كل وقت
انهمري ...

19

- (1) زين و شيرين أسماء لفتاتين هما بطلتا ملحمتي حب كرديتين
- (2) بردايات الطنبور و هي أشرطة تلف على ذراع آلة الطنبور لتحديد النغمات الموسيقية.
- (3) الطنبورات جمع طنبور و هي آلة موسيقية وترية كردية و تعتبر الآلة الأكثر شعبية لدى الكرد.
- (4) سيان : اسم جبل من جبال كردستان و ارتبط اسمه بملحمة كردية مشهورة اسمها (سيامند و خجي)

فرهاد عجمو شاعر كردي ولد في مدينة القامشلي عام (1960) و عاش فيها، امتاز بكتابة قصائد للأطفال اضافة الى قصائد للكبار و العديد من القصائد الغنائية التي غناها كبار الفنانين الكرد، عبر في شعره عن هموم شعبه و قضيته، توفي الشاعر في 8 حزيران 2017 تاركا خلفه ارثا قيما من الأدب و الشعر.



Koçberên Serêkaniyê û hêviya vegerê



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya



العدد (٧٠) ٢٠٢٠/١/١ م